

Panorama
Rêweresma Şehîdê Azadiyê û Rûmetê
Dr.Şêrzad Hac Reşîd (Elemdar)

Li roja Pêncşemê 9.2.2012z-2623k , dora heft û nivê êvarî , hevalê nemir Dr.Şêrzad ji aliyê hin kuştîyan ve – tevî otombîla xwe li bajarê Helebê hate revandin û kuştin .Li roja dî sibehê,heval,meriv û xismên wî nûçeya reş a kuştinê hat bihîstin û dûre cenaza wî ji pijîşkxanê derxistin û birin li çêxaneya osman (taxa Eşrefiyê) danîn.

Li roja Şemiyê , kat neh û nivê sibehê, bi sedan meriv,heval,dost,berketî û rêvebirên Partiya Yekîti Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê , cenaza pakrewan bi gul û çiçek,wêneyên wî , girî û şîn û liliyan ji çêxaneyê deranîn û berve cîzayîna wî(gundê Elemdara) ve birin. Li ser riya Efrînê , nêzik gundê Lêremûnê karwan careke dî hinekî rawest , ta ku , li saz bikeve û wêne bi otombîlan dikevin. Li kat dehan karwana cenazê berve kurdaxê bi rê ket. Li nêzik mezela zareta Henên , ji aliyê gelek hevalên wî û xelkê kurdaxê ve tevî hildana ala rengîn , simbola partiyê û wêneyên wî-cenaze Dr hate pêşewazîkirin, û dîsa li destpêka bajarê Efrîn ê pêşewaziya wî dubare bû. Her çû karwan mezin bû û weha di nav bajarê xemgîn re hate derbaskirin. Li destpêka bajaroka Reco ve jî, ji aliyê heval û hogirên wî ve pêşwaz bû. Û weha domand ta giha gundê Elemdara mala Bavê Şêrzad .Bi beşdariya bêtirî deh hezar xelkê me yê kurd , nûnertiyên rêxistinên P.Y.D.Ks ên kobaniyê û Reqê – di pêşî de ,gelek komikên folklorî û giropek ji pijîşkan bi cilên xwe yên fermî – Cenaza hevalê Şêrzad ji malê bi derxistin û bi dilên xemgîn , çavên ziwa, girî û şîn , berdana gulan, siloganên Azadî û nerazîbûnê û sitranên Şivan Perwer , govdeyê nemirê me , di goristana gund de hate binaxkirin. Piştî telqîn mele ji giyana wî re , rêweresma gotinan dest pê kir. Kêlîkek bêdeng li ser giyana pakrewanê me hate rawestandî,

sipasiya beşdaran bû , gotina rêxistina xwendekaran a P.Y.D.Ks li Heleb, gotina Buhara Kurdî,gotina şêxê Ezdiyan û paşê jî gotina P.Y.D.Ks ji aliyê sekreterê partiyê mamoste Mihyedîn Şêx Alî ve hatin xwendin. Û bi dehan birûskên sersaxiyê yên ji encûmena kurdî ,partî,sekretêr, rewşenbîr, siyasetmedar û kesatîyên serbixwe ve ji aliyê pêşkêşvan ve hatine zimên . Li dawiyê ji aliyê beşdaran ve, meriv û hevalên wî hatin sersaxiyê bi hebûna xwedîyan, sekretêrê û gelek rêvebirên P.Y.D.Ks çar rojan li Gundê Elemdara dirêj kir.

Gotina komîta bijîjkan ya Buhara kurdî di rêwresma pakrewan Dr. Şêrzad Hac Reşîd li gundê Elemdara – Kurdax roja 11.02.2012

Îro rojek xemgîne , rojek bi şîne , rojek tarî ye .

Vaye em dispêrin gorê , ciwanekî , bijîjkekî , paşerojekî , erê paşerojekî .

Ku em tev li hêviyê bûn , welat hemû li hêviyê bû ...

Kek Şêrzad

Ên ku jiyana te vemirandin , xwastin giyanê me vemirînin .

Kek Şêrzad

Ên ku jiyana te dizîn , xwastin xewnên me bidizin .

Kek Şêrzad

Ên ku kenê te kuştin , xwastin buharê di vê erdê de bikujin , lê buhar namirê ... buhar namirê .

Xwişk û birayên delal ...

Tiştê li vê welatî dibe , divê em bi hişmendî, li ser rawestînin , da ku gel û welatê me di zêrzmînek reş werenebe .

Em banga gelê xwe û hêzên xwe yên siyasî dikin , ku rê nedin destên qirêj û tarî têkevin nav me û bi paşeroja me bilîzin .

Dilovaniya Xwedê li te be , Şehîdê Efrînê ...

Dilovaniya Xwedê li te be

D.R (7)